

Mulemme' û di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de Şêweyên Mulemme'ê

Mulemma and Forms of Mulemma in Classical Kurdish Literature

M. Zana KARAK* & Seher BÎŞAROĞLU*

PUXTE:

Di edebîyata klasîk a rojhilatî de mulemme' xwedî dîrokeke kevin e û nimûneyên wê yên ewil di sedsala 10em de tîn xuyakirin. Helbestên bi terza mulemme'ê di edebîyata Erebi, Farişî û Tirkî de gelek hatine nivîsîn. Kurd jî yek ji gelên Rojhilatî ne û di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî mulemme' cihêkî girîng digire. Li gorî agahiyên ber dest di edebîyata Kurdî de jî ji sedsala 16em heta roja me mulemme'ên tam hatine nivîsîn. Dîsa li gorî agahiyên li ber dest yekem mulemme'a tam a Kurdî jî aliyê Hemîdî ve hatiye nivîsîn û piştî wî gelek şairên Kurd bi şêweyên cur bi cur helbestên mulemme' nivîsîne.

Di vê xebatê de di edebîyata Îslamî de ango di edebîyatên zimanên cîran (Erebî, Farişî û Tirkî) de derbarê dîroka mulemme'ê de agahî hatin dayîn û ji edebîyatên cîranan hin nimûne hatin pêşkêşkirin. Di serî de li ser pênaseya mulemme'ê û paşê derbarê dîroka wê de agahî hatin dayîn. Çarçoveya mulemme'ê tam û noqsan û sînore mulemme'ê yê bi telmî'ê re jî nû ve hat nixandin. Derbarê tesnîfa mulemme'ê û şêweyên wê yên di edebîyata Kurdî de bi berfirehî agahî hatin dayîn. Di edebîyata Kurdî de li gorî mînak û daneyên ber dest jî aliyê avakirinê ve analîzek li ser mulemme'an hate kirin. Herweha mînakên şêweyên mulemme'an jî hatin tesbîtîkirin û ev tesbît û tesnîfa wan jî hatin pêşkêşkirin.

Peyvên Sereke: Mulemme', pênase, tesnîf, şêwe, Edebîyata Kurdî ya Klasîk.

* **Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.** MA, Mardin Artuklu University, The Department of Kurdish Language and Culture.
m.zana47@gmail.com Orcid: 0000-0003-1681-4917

** **Xwendekara Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.** MA Student, Mardin Artuklu University, The Department of Kurdish Language and Culture. (seherbisar@gmail.com, Orcid: 0000-0001-9873-4456).

ABSTRACT

Mulemma which is a poetry genre has a historical background in classical Eastern literatures and its first examples date back to the 10th century. Mulemma-shaped poems have been widely written by poets in Arab, Persian and Turkish literatures. Since the Kurds are also a part of Eastern literature, mulamma poems have an important place in classical Kurdish literature as well. According to the sources we have, the first examples of full mulammas in classical Kurdish literature date back to the 16th century. Again, according to the sources we have, the first complete mulamma example in classical Kurdish literature was written by Mela Mehmûd (Hemîdî) and many Kurdish poets wrote poems in different forms after Hemîdî.

This study focuses on the history of mulamma and some examples of Islamic literature (Arabic, Persian and Turkish literatures). In addition, the history of mulamma in classical Kurdish literature was emphasized. In this study, firstly the definition of mulamma was emphasized and examples of Kurdish mulamma written until today were analyzed and classified. Mulemmas were examined according to their structures. Some examples on this subject were given. The framework of the complete and incomplete mulammas and the boundary with the telmî' were re-evaluated.

Key Words; Mulemma, definition, classification, form, Classical Kurdish Literature

1. DESTPÊK

Mulemme' ji koka bêjeya "lem"'ê (لع) tê û maneya wê jî biriqîn e (Bacanlı & Koyun: 2018:144). Mulemme' di ferhengê de tê wateya rengorengoyê (Kurtuluş & Pala, 2006:539). Mulemme' ew helbest in ku ne bi zimanekî tenê, bi du yan zêdetir zimanan hatine nivîsîn. (Adak, 2015:447).

Mulemme' li gorî daneyên li ber dest, ji sedsala X'em û vir ve di edebîyata Îslamî de derdikeve pêş. Li gorî tesbîtan herî pêşî em di edebîyata Farisî de nimûneyên mulemme'ê dibînin. Ev nimûne jî weke "Zu'l-lîsaneyn" ango duzimanî hatine binavkirin (Kurtuluş & Pala, 2006:539).

Helbestkaran ji bo zanîna û hunera xwe nîşan bidin di helbestên xwe de serî li mulemme'ê dane. Di edebîyata Îslamî de ev nivîsîna mulemme'ê gelekî berbelav e. Em di edebîyata Erebi, Farisî û Tirkî de rastî nimûneyên mulemme'ê tên. Ji ber ku edebîyata Kurdî ya klasîk jî perçeyek ji edebîyata Îslamî ye, wan jî ji edebîyatên cîranan hin tişt model stendine û hin tişt teqlîd kirine. Em di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî rastî helbestên bi şeweya mulemme'ê tên. Ji ber ku alim û edîbên Kurd jî xwestine zanîna û hunera xwe ya zimanan nîşan bidin, di helbestên xwe de ji mulemme'an gelek nimûne dane.

Bi piranî di mulemme'ên Kurdî de li ba ziman û zaraveyên Kurdî em rastî zimanên Erebi, Farisî û Tirkî tên. Alim û şairên Kurd ji ber ku zimanê Erebi hem zimanê zanist û Qur'anê hem jî ji ber ku Kurd cîranên Ereban bûne fêrî vî zimanî bûne û bi vî zimanî axivîne. Zimanê Farisî jî ji bi minasebta zimanê edebîyat û

rewşenbîrîyê bû Kurd fêrî vî zimanî jî bûne. Herwiha zimanê Tirkî (Osmanî) jî ji ber ku zimanê dewlet û resmîyetê bû Kurd hînî vî zimanî jî bûne.

Ji ber van hemû egeran gelek alimên Kurd bûne pirziman û ev pirzimanîya xwe di qada ilm û edebîyatê de jî nîşan dane. Weke huner jî di helbestên xwe de ev hemû ziman û zarave di şêweya telmî' û mulemme'ê de bi kar anîne. Li gorî nimûneyên ber dest mulemme'ên Kurdî ji aliyê zarave û zimanan ve mîna yênen Erebi, Farisî û Tirkî dewlemend û rengîn e.

Edebîyata Kurdî ya klasîk jî weke edebîyatên cîranan xwedî dîrokeke kevin e, lêbelê heta niha bi temamî nehatiye zelalkirin. Bi xebatên nû roj bi roj helbestkar û berhemên nû derdikevin holê. Li gor lêkolera edebîyata Kurdî di sedsalên 16.-18. de gihaştîyê lûtkeya xwe û berhemên gelekî bi qîmet ji aliyê kesên weke Melayê Cizîrî (w.1640), Şêx Şemsedînê Exlatî (w.1674), Ehmedê Xanî (w.1707), Feqîyê Teyran (w.1640) di vê serdemê de hatine dayîn. Dema em li atmosfera wê serdemê mêze dikin tê dîtîn ku li herêmên Kurdan mîrektîyên Kurd xwedî desthilatdar in. Mîrektîyên Kurd di wê serdemê de ji bo gel xizmetên civakî kirine ku avakirina medreseyan jî yek ji wan xizmetan e. Piranîya helbestkarên ku di wê serdemê de jîyana xwe borandine di medreseyên mîrektîyan de perwerde bûne. Şert û mercên guncav rê li ber edebîyata Kurdî vekiriye û edebîyata Kurdî ya klasîk di vê serdemê de gihaştîyê lûtkeya xwe. Di vê serdemê de berhem û helbestên cur bi cur hatine nivîsanîn ku mulemme' yek ji wan cureyên helbestan e.

Li gor agahîyên berdest mulemme'nûsê herî kevin yê edebîyata Kurdî ya klasîk Hemîdî ye. Heta niha ji bilî mulemme'a wî ti helbestên wî nehatine dîtîn, lê ji mulemme'a wî ya çar zimanî dîyar dibe ku helbestkarekî bihêz e û îhtîmal heye ku helbestên wî yênen dîtir jî hebin. Mulemme'a Hemîdî ji 28 malikan pêk tê, lê malika 16em kêm e û li ber destê me 27 malik hene. Hemîdî mulemme'a xwe bi Erebi, Farisî, Tirkî û Kurdî nivîsîye (Ertekin, 2020:13).

Mela Ehmedê Cizîrî di edebîyata Kurdî de yekem kes e ku dîwaneke muretteb nivîsîye û ji aliyê helbestkarîyê ve di asteke bilind de ye. Dîwaneke wî ya muretteb bi Kurdîya Kurmancî heye. Di nav helbestên Mela de heşt helbest jê ji aliyê me ve di çarçoveya mulemme'ê de hatine tesbîtkirin û nîrxandin (Bnr.; Cizîrî, 2019:24, 86, 89, 98-99, 157-158, 161-162, 175, 241-243).

Helbestkarekî gelekî girîng yê serdema mîrektîyan jî Şêx Ehmedê Xanî ye. Xanî çar berhemên giranbiha yênen weke *Dîwan*, *Aqîdeya Îmanê*, *Mem û Zîn û Nûbihara Biçûkan* bexşî edebîyata Kurdî ya klasîk kirine. Xanî mulemme'eke çar zimanî nivîsîye. Mulemme'a Xanî bi Erebi, Farisî, Tirkî û bi Kurdî ye. Berhema Ehmedê Xanî ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* jî ferhengeke menzûm ya bi Erebi û Kurdî ye. Ji ber ku belaxetnas ferhengên menzûm weke mulemme'ê qebûl nakin, me jî di nav mulemme'ên Ehmedê Xanî de cih neda nimûneyên vê berhemê. Di edebîyata Kurdî ya klasîk de helbestkarên weke Ehmedê Xasî, Osman Efendîyê Babîj (Kırkan, 2018:87-88), Nalî, Salîm, Kurdî, Seydî, Cafer Qulîyê Zengelî û bi dehan

helbestkarên dinê jî bi ziman û zaraveyên cuda mulemme'ên hunerane yên cûr bi cûr nivîsîne.

Xebatên ku li ser mulemme'ên Kurdî hatine kirin ne zêde ne. Di vê mijarê de bi qasî ku me lêkolîn kiriye pirtûkên serbixwe jî tunene. Lê kesên weke Roşan Lezgîn, Ahmet Kirkan, Abdulhadî Botî (Abdülhadi Timurtaş), Abdurrahman Adak, Kadri Yıldırım, Hayrullah Acar, Murat Varol, Tehsîn Îbrahîm Doskî, M. Zahir Ertekin û Ayhan Yıldız di edebîyata Kurdî de li ser vê mijarê xebitîne. Di van xebatan de li ser mulemme'ên Kurdî û mulemme'nûsên Kurd agahî hatine dayîn. Di amadekirina vê xebatê de jî xebatên lêkolerên navborî di serî de ji gelek gotar û pirtûkan sûd hatiye wergirtin.

Di çarçoveya vê xebatê de qesta me ji edebîyata klasîk ev e ku edebîyata klasîk a Îslamî ya Rojhilatê ye (Edebiyata Kurdî, Tirkî, Farisî û Erebi). Li vê derê em dê bala xwe bi taybetî bidin ser nimûneyên mulemme'ên ji edebîyata Kurdî. Lêbelê ligel Kurdî em dê behsa mulemme'ên edebîyatên dinê yên zimanê Tirkî, Farisî û Erebi jî bikin û em ê bala xwe nedin nimûneyên ji edebîyatên Êrdî, Hindî û hwd.

2. MULEMME' DI EDEBÎYATA KLASÎK DE

2.1. Pênaseya Mulemme'ê

Mulemme' ji peyva "leme"'ê (لمع) tê û ew jî tê maneya "birîqîn" a û wek lêker jî tê maneya boyaxkirina qumaşê bi rengê cûr bi cûr (Bacanlı & Koyun: 2018:144). Mulemme' di ferhengê de tê maneya "rengorengo, belek"ê. (Kurtuluş & Pala, 2006:539). Bikaranîna du zimanan wek telmî', helbestên ku bi vî awayî hatine nivîsîn jî wek "mulemme'" tên binavkirin (Adak, 2019:205). Di edebîyatê de ji bo helbestên ku bi çendîn zimanan tene nivîsîn ji wan re mulemme' tê gotin. Divê helbestek herî kêr bi du zimanan bê nivîsandin ku mulemme' derbikeve holê. Mulemme' bi çend zimanên cuda lê bi heman serwa, kêş û şeweyê ve tene nivîsîn. Nexwe em dikarin bibêjin ku di termînolojîya edebîyatê de mulemme' ew helbest in ku di nav sîstemekê de herî kêr ji du zimanan pêk tên.

Mulemme' ku cureyeke hunerane ya helbestê ye, bêtir di xezalan de derdikeve pêş (Acar, 2016:89-90). Herçiqas bêtir di xezalan de derketibe pêş jî mulemme'ên ku bi teşeyên weke qesîde, muselles, murebbe', muxemmes û terkîb-tercî'ê bend jî hatine nivîsîn hene. Heta hejmara helbestên mulemme'ên ku bi teşeya çarîneyê û bi çar zimanên cuda hatine nivîsîn di edebîyata Kurdî de gelek in. Lewra Kurd li gor gelên din li herêmê bindesttir bûn û wan pêwîstî bi hînbûna zimanên weke; Erebi, Farisî û Tirkî ditîne. Hem ji aliyê erdîngarîyê ve hem jî ji aliyê sîyasî ve Kurd di bin tesîra wan zimanan de mane.

Mulemme' hunereke dersînor e, bi vê hunerê sînoren ku di nav dewlet û zimanan de ne ji holê radibin û çend zimanên cuda di heman helbestê de cih digirin, ev yek jî helbestê rengîntir dike. Piraniya mulemme'nûsan ji bo ku qabîliyeta xwe ya

helbestê bide nîşan mulemme' nivîsandine. Ew kesê ku mulemme'ê dinivîse divê hem zimanên ku dê bi kar bîne baş bizanibe hem jî divê kêr zêde hakimîyeteke helbestkar li ser edebîyata wan zimanan hebe da ku bikaribe mulemme'an binivîse.

Di gotara Tehsîn Îbrahîm Doskî û Zahir Ertekin de sedema nivîsandina mulemme'ê weha hatiye ravekirin: "Farisî jî piştî Erebi weke zimanê edeb û helbestê dihate zanîn û ew jî piştî Erebi weke zimanê duyem di nava zanayên Kurd de belav dibû, gelek edîbên Kurd bi vî zimanî berhem dianîn wicûdê. Tirkî jî ji ber ku zimanê dewleteke serdest bû ku Kurd di nava sînorên wê dewletê de dijîyan, bivênevê dihate elimandin" (Doskî & Ertekin, 2019:43-61). Ji ber ku Kurdan jî di nav dîrokê de bi gelên din re têkilî danîye pêdivî dîtîye ku zimanên weke Erebi, Farisî û Tirkî fêr bibe. Ev têkilî çawa ku di her qada jîyanê de derdikeve pêşberî me di edebîyatê de jî xwe nîşanî me dide. Dema em li mulemme'nûsên Erebi û Farisan mêze dikin tê dîtin ku zimanê Tirkî di mulemme'ên xwe de pir kêr bi kar anîne. Bi qasî ku me lêkolîn kiriye zimanê Kurdî jî di nav mulemme'ên Erebi û Farisî de tune ye. Lêbelê di edebîyata Tirkî de Elîyê Gelîbolûyî, Kurdî jî di nav de bi heşt zimanan mulemme'ek nivîsîye (Adak, 2013:5-6).

Mulemme' hem bi malikan dikare bê nivîsandin hem jî bi bendan, lê piranîya mulemme'ên ku hatine nivîsandin bi malikan hatine nivîsîn, bi taybetî jî di edebîyata Farisî û Erebi de ev yek bêtir e. Dema em li helbestên ku bi terza mulemme'ê hatine nivîsîn mêze dikin tê dîtin ku zêdebûna zimanan li gor miletan jî diguhere. Weke nimûne Fars û Ereban bi piranî mulemme'ên xwe bi du zimanan nivîsandine. Tirkan bi du an jî hindik be jî bi sê zimanan mulemme'ên xwe nivîsîne (Kurtuluş & Pala, 2006:539), pir kêr be jî mulemme'nûsên weke Mistefa Elîyê Gelîbolûyî yên heştzimanî jî hene. Lê dema em berê xwe didin edebîyata Kurdî rewşa wê hinekî cudatir e. Lewra mulemme'ên Kurdî bi du zimanan dest pê dikin û heta bi çar zimanan jî hatine nivîsîn. Hin caran jî çar ziman û du zaraveyên cuda di mulemme'ên Kurdî de hatine bikaranîn. Herweha piştî vê lêkolînê me dît ku rêjeya mulemme'ên bi teşeya çarîneyê û bi çar zimanên cuda hatine nivîsîn di edebîyata Kurdî de ne kêr e.

Li gorî belexatnasan ferhengên menzûm yên pirzimanî nakeve kategoriya mulemme'ê (Calp, 2018:162-181). Berhema Ehmedê Xanî ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* jî ferhengeke menzûm ya Erebi û Kurdî ye û çend ferhengên menzûm ên dinê jî di edebîyata Kurdî de hene. Lê ji ber vê rêzika jor me di nav mulemme'an de cih neda van ferhengên menzûm. Me hunera îham û iqtibasê jî ji mulemme'an nehesiband û me sebebên vê yekê jî di beşên pêş de bi berfirehî îzah kirine.

2.2. Dîroka Mulemme'ê di Edebîyata Klasîk de (Erebi, Farisî, Tirkî)

Mulemme' şêweyeke kevn yê helbestê ye, ev şêwe cara ewil di edebîyata Farisî de di sedsala X'em de ji aliyê Şehîd Belxî (w.315/927) ve hatiye bikaranîn. Belxî

helbestkarekî sedsala X'em e û piştî Belxî di heman sedsalê de Ebû Cafer Endabî (ç.?-w.?) jî bi vê şeweyê helbest nivîsandiyê. Lêbelê berê di edebîyata Erebi û Farişî de helbestên ku bi du zimanan hatine nivîsandin weke "zu'l-lîsaneyn" hatine binavkirin (Kurtuluş & Pala, 2006:539). Di edebîyata Farişî de jî bo helbestên "zu'l-lîsaneyn" Bediuzzemanê Natanzî, Ebu'l-Fazl Hesenê kurê Elî yê Behrewî û Cezaîrîyê Razî cihê girîng digirin. Piştî van kesan gelek kesên di yê weke; Xeznewî (hicrî, w.545/1150), Abdulwasîyê Cebelî (hicrî, w.555/1160), Haqanîyê Şîrwanî (hicrî, w.595/1198), Hafîzê Şîrazî (hicrî, w.792/1389), Mela Camî (hicrî, w.898/1492) û Se'dîyê Şîrazî (hicrî, w.961/1553) bi vê terzê helbest nivîsîne (Kurtuluş & Pala, 2006: 539; Baycanlı & Koyun, 2018: 43-154). Di edebîyata Farişî de Ferehanî (w.1917) di helbestên xwe yê mulemmê' de cara ewil zimanekî rojavayî, Frensîzî bi kar anîye (Yıldırım, 2013:7). Herçiqaqas mulemmê' peyveke Erebi be jî, lê weke têgeh cara ewil di edebîyata Farişî de hatiye bikaranîn (Baycanlı & Koyun, 2018:145).

Di edebîyata Erebi de şeweya mulemmê'ê herî pêşî jî alîyê helbestkarên ne Erebi ve hatiye bikaranîn, paşê helbestkarên Erebi jî dest bi nivîsandina mulemmê' an kirine. Di edebîyata Erebi de ev şewê di heyema dewleta Ebbasîyan de jî alîyê Ebû Nûwas (w.198/813) ve cara ewil hatiye bikaranîn ku ev helbestkar bi eslê xwe Farişî e. Piştî wî helbestkarê Erebi, Ummanî li ser Harûn Reşîd bi şeweya mulemmê'ê helbest nivîsîne (Yıldırım, 2013:7).

Di terzê mulemmê'ê de cara ewil zimanê Tirkî, di helbesteke Mewlana Celaleddînê Romî (Hicrî. w.672) de hatiye bikaranîn. Romî bi zimanên weke Tirkî, Farişî û Çaxatayî mulemmê'ên xwe nivîsîne (Bekki, 2012:485-500).¹ Di sedsala 15em de Nîmettulah Welî di helbestên xwe yê mulemmê' de jî bilî Farişî û Erebi cih daye zimanê Tirkî jî (Calp, 2018:162-181).

Em ê li jêr du malika serî û ya dawî yê mulemmê'a Mewlana Celaleddînê Romî bidin. Di van malikan de Farişî û Tirkî (Çaxatayî) bi kar anîne.

1. Dâni kî men be 'alem **yalguz seni sever men**
Çun der berem neyayî ender gamet **öler men**

7. Mahî çû Şems-i Tebrîz gaybet numûd goftend
Ez dîgerî neporsîd **men söylerem arar men**

(Banarlı, 1983:485-500)

Piştî Mewlana Celaleddînê Romî kesên weke Siltan Weled, Fuzûlî, Aşîq Paşa, Rûhîyê Bexdadî, Nabî, Kinalizade Elî Çelebî, Esrar Dede, Hebîbê Diyarbekirî,

1 Li gorî Salhaddin Bekki, di edebîyata Tirkî de mulemmê' cara ewil jî aliyê M. Celaleddînê Romî ve hatiye nivîsîn.

Mistefa Elîyê Gelîbolûyî bi terza mulemme'ê helbest nivîsîne (Bekki, 2012:485-500; Calp, 2018:166; Kurtuluş & Pala, 2006:539).

Ji van helbestkaran Gelîbolulu Mustafa Ali (Mistafa Elîyê Gelîbolûyî), Kurdî jî di nav de bi heşt zimanan mulemme'ek 10 malikî nivîsîye. Di hemû malikên vê helbestê de risteyên ewil bi Tirkî ne û risteyên din jî her yek ji wan bi zimanekî cuda ye. Mulemme'ên bi vî rengî jî ber ku kêmtêne dîtîn numûneyeke baş e ji bo cureya mulemme'ê. Weke nimûne sê malikên helbesta Gelîbolûyî me li jêr daye.

1. Arap olan *Arabî* dil ile her dem bunu dir (T)
Ene mâ-ârefu gayri hâtî fülüs rûh fî'n-nar (E)
3. *Kürd* olan velvele ile bunu îrâd eyler (T)
Dikujim te tu bizânî dirûvê min tu biyâr (K)
10. Bir iki var *Çağatay* âdemi anlar dahı dir (T)
Bizge bir hakkını biz Mekke'ye kitken kişiler (Ç)
(Adak, 2013: 5-6)

Piranîya helbestkarên Erebb û Faris helbestên xwe yê mulemme' bi du zimanan, bi Erebbî û Farisî nivîsîne, paşê Tirkî jî tevî van zimanan bûye. Mulemme'ên Tirkî jî exlebî bi du zimanan hatine nivîsîn; Tirkî-Erebbî û Tirkî-Farisî ne. Herwiha di edebîyata Tirkî de kêmtêne jî mulemme'ên sê zimanî jî hene, ew jî bi Tirkî, Farisî û Erebbî ne (Kurtuluş & Pala, 2006:539). Ji wan şairan Kinalizade Elî Çelebbî (1510-1572) mulemme'eke 63 malikî û sê zimanî nivîsîye û her malikek bi zimanekî cuda (bi rêzê bi Erebbî, Farisî û Tirkî) ye (Aksoy, 1993:125-144). Ayşe Teymûrî jî mulemme'eke sê zimanî nivîsîye. Bi rêzê du malik bi Farisî du malik bi Tirkî û du malik jî bi Erebbî nivîsîye. Bi vî awayî şeş malik bi Farisî, şeş bi Tirkî û şeş jî bi Erebbî bi tevahî mulemme'a wê jî 18 malikan pêk tê (Kalyon, 2015:1425-1436). Herweha Osman Esad Efendîyê Babîj (1852-1929) ku xwedî mewlûda Kurdîya Zazakî ye, wî jî dîsa bi Farisî, Erebbî û Tirkî mulemme'eke (Kırkan, 2018: 87-88) 10 malikî (3 malik bi Farisî, malikek bi Erebbî, 4 malik bi Tirkî û dîsa 2 malik bi Erebbî) nivîsîye.

3. MULEMME' DI EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK DE

Di edebîyata Kurdî de mulemme' cihekî girîng digire û ev cure helbest ji aliyê gelek kesan ve hatiye nivîsîn. Lewra piranîya helbestkarên Kurd li medreseyan perwerde bûne û li medreseyan fêrî zimanên weke Erebbî û Farisî bûne. Dema em li erdîngarîya ku Kurd lê dijîn mêze dîkin, dewletên ku ji aliyê gelên Erebbî, Farisî û Tirkî ve hatine avakirin hene. Ev yek jî Kurd jî tê de di nav gelên Rojhilata Navîn de bûye sedema danûstandinên ilmî, çandî, bazirganî û zimanî. Piştî sedema

mîrektîyên Kurd jî ji ber ku desthilatiyeke domdar a Kurdan a serbixwe çênebûye û nebûne xwedî hêzeke xurt a sîyasî; Kurd ketine bin desthilatdarîya gelên din. Ji ber vê yekê jî tesîra zimanên din li ser Kurdan bêtir çêbûye û heta ku Kurd bi wan zimanan helbest jî nivîsîne. Sedemeke dinê jî ya pîrzimanîya helbestkarên Kurd ew e ku hebûna perwerdeyeke pîrzimanî ya di medreseyên Kurdan de ye.

Di edebîyata Kurdî de heta dereng jî yekem mulemme' weke yên Melayê Cizîrî dihate zanîn, lê piştî ku helbesta Hemîdî derkete holê ev rewş guherî û li gor daneyên li ber destan Hemîdî berî Melayê Cizîrî jîyaye û ev peydakirina helbesta Hemîdî bi kevinbûna xwe, dikare destpêka dîroka edebîyata Kurdî biguherîne (Ertekin, 2020:10-16). Lewra li gor ku Tehsîn Îbrahîm Doskî di pirtûka xwe ya bi navê *"Baxê Îrem"* de dîyar dike ku Hemîdî helbestkarê herî kevin e ku heta niha hatiye kifşkirin û cara ewil di edebîyata Kurdî de wî mulemme' nivîsîye.²

Demam em li edebîyata Kurdî mêze dikin, mulemme' ji aliyê gelek kesan ve hatine nivîsîn. Di edebîyata Kurdî de ji aliyê gelek helbestkaran ve bi ziman û zaraveyên cuda helbestên mulemme' hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê dabeşkirineke li gor zaraveyan jî bê kirin dê mijar zelaltir bibe.

Li gorî daneyên li ber destê me heta niha bi Kurmancî, Soranî, Zazakî (Dimilkî/ Kirmanckî) û Goranî (Hewramî, Lorî, Kelhorî, Lekî) helbestên mulemme' hatine nivîsîn û tesbîtkirin.

Abdulhadî Tîmurtaş di gotara xwe ya bi navê *"Hunera Mulemme'ê di Edebîyata Rojhilat de Mînaka Şî'ra Kurdî-Kurmancî"* de ji bo helbesta Mela ya ku bi risteya *"Min di ber qalûbela batin vi wê ra bû evîn"* dest pê dike, gotiye mulemme' e (Tîmurtaş, 2020: 15). Lêbelê ev helbest texmîseke li ser helbesta kesê ku navê wî Celal e (Doskî, 2019:176-177). Ji ber vê yekê jî ev nabe mulemme', lêbelê dibe nezîre û ji ber ku pîrzimanî (Kurdî-Farisî-Erebî) ye jî dibe tezmîna mulemme'ê. Di edebiyata Kurdî de di zaraveyên Kurmancî, Soranî û Goranî de nimûneyên tezmînan gelekî berbelav e.

3.1. Mulemme' di Zaraveyên Kurdî de

3.1.1. Mulemme' di Zaraveyê Kurmancî de

Mulemma di edebîyata Kurdî ya Kurmancî de di sedsala 16em de dest pê kiriye û cara yekem ji aliyê Hemîdî ve hatiye nivîsîn. Lê piştî Hemîdî gelek kesên din ên weke Melayê Cizîrî (1567-1640), Ehmedê Xanî (1650-1707), Melayê Bateyî (Sedsalên 17-18em), Ce'ferqulîyê Zengelî (1799-1894), Şewqîyê Xanî (Sed-

2 Ev îfade bi agahiyên ber dest re girêdayî ye û gava di lêkolînên nû de nimûneyên nû werin peydakirin dê ev agahî jî werin guhertin. Lêbelê ji bo mulemme'a tam niha ev agahî li ber destê lêkoleran e. Li gorî lêkolînên nû dibe ku şeweyên cuda û nimûneyên kevintir jî bên peydakirin.

sala 19em?), Şêx Ehmedê Feqîr (Sedsala 19em), Mela Ebdurehmanê Melakendî (w.1874), Şêx Îbrahîmê Çoqreşî (1846-1881), Mela 'Ebdul'ezîzê Bidlîsî (Şeyda, 1855-1924), Mela Mihemedê Lîceyî (w.1911), Mela Ehmedê Heyderî (w.1937), Kerbelayî (w. 1939), Mela Ehmedê Muxlis (Nalbend, 1891-1963), Qanî, Biharî, Bazelî, Mela Zahirê Tendurekî (w.1966), Mela Yasînê Yûsrî (1906-1994), Şêx Îsmetullahê Karazî (1908-1996), Şêx Mihemed Emînê Heyderî (1927-2003) û Mela Ehmed Yalar (ç.1954-...) jî bi Kurmancî mulemme' nivîsîne (Acar, 2016:226; Adak, 2016:37; Beyter, 2013:62-63; Biçici, 2007:259; Doskî, 2011:37-38; Doskî, 2020:113-117; Doski & Ertekin, 2019:4163; Ertekin & Yıldız, 2020:69-73; Gezer, 2015:146-148; Heyderî, 2019:335-336; N. Ertekin, 2015:413-436; Jafarzade & Bedirxan, 2018:129; Karak, 2020:279-281).

Li jêrê em dê weke mînak ji mulemme'ên tam³ yên Kurmancî du nimûneyan bidin. Bendên ewil û yê dawî ji mulemme'a Şewqîyê Xanî û ya Mela Ehmedê Heyderî weha ne.

1. Hubbuka afna şababî ya habîbî fi't-te'eb (E)
 'Îşqê to begdaxti canim der cefa û tab û teb (F)
 'Eql û huşim qalmaidî şebr û qerarim gitdî hep (T)
 Şotime ji dağa firaqê lew dinalim rûz û şeb (K)

6. Rebbena' eġfir zeneb men nacike bi'l-qalbi's-salîm (E)
 Girdigara rehmi kun ber bendeyê pîr û seqîm (F)
 Fazl û îhsanin diler bîçare qulun ya Kerîm (T)
 Da bi fedla xwe 'efû key **Şewqîyê Xanî-neseb** (K)
 (Adak, 2016:36-65)

Şewqîyê Xanî vê mulemme'a xwe bi teşeya murebe'ê bi şeş bendan nivîsiye û di her bendeke wê de çar ziman hatine bikaranîn û her risteyek bi zimanekî cuda ye. Ev ziman jî bi rêzê ev in: Erebi, Farişî, Tirkî û Kurdîya Kurmancî.

1. Qed qeweste`l-qametî be`de`l-firaqî bi`l-lehaz (E)
 Dûriya dîdarê to şod der derûnê men meraq (F)
 Bendeniz bülbül gibi gece ve gündüz kış (ş)u yaz (T)
 Ah û nalan lew dikêşim lerizîn Şam û 'Iraq (K)

8. Bel mîne`d-derbî`n-neşabi`l-firquetî ya **Heyderî** (E)
 To çûnîn hemware mîayî be ne`rê ejderî (F)

3 Ji bo mulemme'ên tam li beşa "Mulemme' ji Aliyê Avakirinê ve" binêrin. Li wir hatiye ravekirin.

Sen de ya **Ehmed** içip sen hicretin fincanları (T)

Lew şev û rojan dibêjî el-fîraq û el-fîraq (K)

(Beyter, 2013:177-179)

Mela Ehmedê Heyderî ev mulemme' a xwe bi çar zimanan nivîsîye, mulemme' a wî bi tevahî ji heşt bendan pêk tê û weke çarîneyan nivîsîye. Risteya ewil bi Erebi, risteya duyem bi Farisî, risteya sêyem bi Tirkî û risteya çarem jî bi Kurmancî ye. Heyderî ji serî heta dawî ev sîstem şopandiye û mulemme' eke tam nivîsîye.

2.1.2. Mulemme' di Zaraveyê Goranî de

Di zaraveyê Goranî (Kelhorî, Lorî, Hewramî) de jî mulemme' hatine nivîsîn, helbestkarên weke, Mela Muhemmed Hewremanî (Seydî) (hicrî 1199-1265/1848), Hîlmî Kakeyî (1882-1966) mulemme' nivîsîne. Mela Muhemmed (Seydî) ev mulemme' a xwe bi 13 malikan û bi zimanên Hewramî - Farisî nivîsîye. Malika yekem û 13em ya mulemme' a Seydî ev in:

1. جۆفونیم شر، مەزولاًو کئی بەروداد

خلل اندر اساس عمر افتاد

13. ئەگەر تە پیر و پیریت بۆ نکاکار

شوی (صیدی) ز نار دوزخ آزاد

(Kardoxî, 1971:51-54)

Risteya ewil bi Goranî (Hewramî) ya duyem jî bi Farisî ye. Gelek mulemme' ên Seydî hene. Di nav helbestên wî de mulemme' ên Hewramî-Farisî û Farisî-Erebî jî hene.

Nimûneyên vê zaraveyê Goranî yên derbarê tezmîna mulemme' an de jî zêde ne. Helbestkarên Goran yên weke Me'sûm Sefî'î (hicrî, ç.1336-...), 'Ebbas Kemendî (h.1331-1393), Momîn Yezdanbexş (ç.1335-...), Riza Cemşîdî (ç.1351-...), Ednan Mûradî (ç.1350-...) bi piranî li ser xezelên Hafiz (w. 792/1389), Se' dî (w.961/1553), Camî (w.898/1492) û Mewlana (w.672/1273) tezmîn nivîsîne û bi vî awayî tezmînên mulemme' pêk anîne (Bnr.; Nûranî, Deh'ebasanî & Ehmedî, h. 1397:1-32). Ehmedê Kor (1771-1856) jî li ser xezela Hafiz tezmînên mulemme' ê nivîsîye.

3.1.3. Mulemme' di Zaraveyê Soranî de

Li gor daneyên ber destê me; di zaraveyê Soranî de mulemme' piştî zaraveyê Kurmancî dest pê kiriye. Mela Xidir (Nalî) (1800-1856), Ebdurrehman Beg (Salim) (1805-1869) û Mistefa Beg (Kurdî) (1812-1850) hevçaxê hev in û ji ber vê yekê jî em nizanin bê kê ji wan pêşî mulemme' bi Kurdîya Soranî nivîsîye. Li ber destê me jî

daneyên di vê mijarê de zêde tune ne. Lêbelê ji ber ku edebîyata zaravayê Soranî ya klasîk bi Nalî dest pê kiriye, ihtîmale ku dê di vî zaraveyî de jî yekem mulemme' a Nalî be.

Di edebîyata Soranî de kesên weke; Nalî, Salim, Kurdî û Şêx Riza Talebanî (1837-1910) bi Soranî gelek mulemme' nivîsîne. (Adak, 2016:37; Ertekin & Yıldız, 2020:70). Wefayî (1838-1899) jî bi Soranî û Farisî neh malik nivîsîye (Necarî, 1969:303-304). Em ê li jêr ji mulemme'ên Salim, Mistefa Begê Kurdî û Hemdî (1876-1936) sê nimûneyan pêşkêşî we bikin.

1. Xerqe le dilim peykan peyweste le mujganî (K)

Çak est girîbanem ez çak girîbanî (F)

7. Heyranî rehî 'işqin, ger şemse weger mensûr (K)

(Salim), nebûd peyda zîn badiye payanî (F)

(Salim)

Salim (Ebdurrehman Beg) vê helbesta xwe bi Kurdîya Soranî û Farisî nivîsîye û bi tevahî heft malik in. Salim di malikan de risteyên ewil bi Soranî û risteyên duyem jî bi Farisî nivîsîne.

1. Horiyî baxî cînanî ya gulî Baxî Îrem? (K)

Em nucûm 'l-'ers? Em şemsu 'ela fewqî 'l-'alem (E)

9. Çünke namey derdî Kurdî qet nehate întîha (K)

Temmetu 'l-qirtasu, cef el-hibrû we'nşeqqe'l-qelem (E)

(Kurdî)

Ev helbesta Mistafa Begê Kurdî ji neh malikan pêk tê. Mistafa Begê Kurdî ev helbest risteyek bi Kurdîya Soranî û risteyek jî bi Erebî honandiyê.

3.1.4. Mulemme' di Zaraveyê Zazakî (Dimilî/Kirmanckî) de

Edebîyata Zazakî ji ber ku piştî edebîyata Soranî dest pê kiriye asayî ye ku nivîsîna mulemme'ê jî piştî edebîyata Soranî dest pê kiribe. Li gorî daneyên ber dest di edebîyata Zazakî de mulemme' cara ewil ji aliyê Melayê Xasî (1867-1951) ve hatiye nivîsîn. Ji bilî Melayê Xasî kesên weke; Mele Ehmedê Kavarî (ç.1941-...) û Mela Ezîzê Cebexçûrî (ç.1945-...) jî bi zaraveyê Zazakî helbestên mulemme' nivîsîne. Mela Mihemedê Hezanî (Mem) (ç.1938-...) jî bi zimanê Erebî, Farisî, Kurmançî, Zazakî û Tirkî mulemme' nivîsîye (Çiftçi, 2015:59). Me li jêr ji serî û ji dawîya mulemme'ên Xasî û Kavarî ji her yekê du bend mînak dane.

1. Merheben ya men 'ela bi'l-husnî teqwîme'l-beşer (E)
Hafizeş Xaliq şewed ez çeşmê bednam û nezer (F)
Mucîdî esbab û alat û we ma mînha seder (E)
Dil ji qeyda leşkerê xem kir reha wextê seher (K)
Ah û nalînê verînî biy vinî nêmerd eser (Z)

6. Fate nûru'l-hikmeti fî dari men fîha 'amûn (E)
Xasiya xafil meşew ba îin meqalet enderûn (F)
Rah-ı xizlane sülük çok itdi erba-i fûnûn (T)
Yazi yû xettê humayûn da bi te'wîlê zebûn (K)
Eşkera va dîtîşey Humay mehalo bi xeter (Z)
(Lezgîn, 2011: 7-9)

Xasî mulemme'a xwe bi heşt bendan û bi teşeya muxemmesê ango bi pêncîneyê nivîsîye. Tê de çar ziman (û bi du zaraveyên Kurdî) bi kar anîne. Ev ziman û zarave ev in: Erebi, Farişî, Tirkî, Kurdîya Kurmancî û Kurdîya Zazakî. Xasî ji serî heta dawî mulemme'eke bipergal nivîsîye, hemû ziman ji bilî îstîsnayên pir biçûk ji alîyê rêjeyê ve weke hev hatine bikaranîn.

1. Xerîbî zor a ey bira (Z)
Ger rohnî bidî wek çira (K)
Weten gelir her xatira (T)
Xerîb der men karkerde est (F)

6. **Kavarî** şew û roj vano (Z)
Dawî naye derd giran o (K)
Sebir mewladan ayan o (T)
Xerîb der men karkerde est (F)
(Kavarî, ?: 48)

Mela Mihemedê Kavarî jî weke Melayê Xasî mulemme'eke pîrzimanî nivîsîye. Kavarî bi teşeya çarîneyê nivîsîye û wî bi sê ziman û du zaraveyên Kurdî nivîsîye, ew jî ev in; Farişî, Tirkî, Kurdîya Kurmancî û Kurdîya Zazakî. Mulemme'a Kavarî jî şeş bendan pêk tê.

Di destên me de du mulemme'ên Mela Mihemedê Hezanî (Mem) jî hene. Yek jê bi yek çarîneyê û her rîsteyeke wê bi zimanekî cuda; bi rêzê bi Kurdîya Kurmancî, Tirkî, Erebi û Farişî ye. Mulemme'a duyem jî ji şeş malikan pêk tê û her malîkek wê bi zimanekî ye. Zimanê wê jî bi Kurdîya Kurmancî, Tirkî, Erebi, Farişî û Kurdîya Zazakî ye.

3.2. Ji Alîyê Avakirinê ve Mulemme'ên Kurdî

Dema em li mulemme'an mêze dikin tê dîtîn ku ji alîyê avakirinê ve cuda ne. Hin mulemme' bi tamamî li gor qaîde û pergalekê hatine nivîsîn hin jî di wan de ti pergal tune ye û bi tevahî li gorî qaîdeyekê nehatine nivîsîn. Di gotar û pirtûkan de ku me xwe gihandinê em rastî tesnîfa ku mulemme'an ji alîyê avakirinê ve dabeş dike, nehatine. Lêbelê di gotara Ertekin & Yıldız de em ji vî alîyê mulemme'an ve rastî tesnîfekê tên. Van nivîskaran di gotara xwe de ji vî alî ve mulemme' weke mulemme'ên hevgerî (muretteb) û mulemme'ên şikestî (sist) dabeş kirine (Ertekin & Yıldız, 2020:69-73). Mehrali Calp jî di gotara xwe ya bi navê *"Ahmed-i Hânî'nin Mûlemma' Bir Gazeli ve Divan Edebiyatımızdaki Yeri"* de derbarê vê mijarê de gotiye: "Ew helbestên ku her malikeke wê bi dorê bi zimanekî cuda hatiye nivîsîn jê re mulemme'a tam tê gotin" (Calp, 2018:166). Herweha Hasan Aksoy jî dibêje mulemme' du cûre ne; di helbestê de bi rêzê her malikek bi zimanekî hatibe nivîsîn jê re mulemme'a tam tê gotin û helbestên ku risteyên wê bi zimanên cuda hatibin nivîsîn ji vê yekê re jî telmî' tê gotin (Aksoy, 1993:132).

Ji ber ku di mijara tesnîfa mulemme'an de kategoriyek bi rêkûpêk tune bû û di nav xwe de nehatibûn dabeşkirin ango em lê rast nehatin, me hewcedarî bi tesnîfeke nû dît. Me jî di vê xebata xwe de ji bo kirina tesnîfekê giraniya xwe da ser sîstema ku di mulemme'an de hatiye bikaranîn û me li gorî vê sîstemê tesnîfa xwe pêk anî. Bi nêrîna me ji bo vê tesnîfê rêbaza herî girîng hebûna sîstemekê ye.

Me mulemme' ji alîyê avakirinê ve li gorî sîstemekê li ser du navan dabeş kir. Me weke "Mulemme'ên Tam" û "Mulemme'ên Naqis" ev tasnîf pêk anî. Gava me ev nav tercîh kirin, me piştî xwe da tesnîfên termînolojîya edebîyata klasîk. Lewra gava ku ji bo tesnîfekê nav hatiye bikaranîn; ji bo tiştên tam, bipergal, tekûz û sîstematik bi piranî îfadeya "tam" hatiye bikaranîn. Herweha ji bo tiştên bêpergal, kêr, noqsan, şikestî û di wan de sîstemek bi rêk û pêk tune ye jî bi piranî îfadeya "naqis/noqsan" hatiye bikaranîn. Herweha ev tesnîf di cînas û îqtîbasan de jî tê dîtîn. Weke cînasên tam û naqis/noqsan, îqtîbasên tam û naqis ango îqtîbasên kêr.

3.2.1. Mulemme'ên Tam

Hin mulemme' ji serî heta dawî bi heman şêweyê tên nivîsandin û her risteyek bi zimanekî cuda û bi rêkûpêk tên nivîsandin. Em dikarin van mulemme'an weke **mulemme'ên tam** bi nav bikin. Di van mulemme'an de sîstemek heye û helbest ji serî heta dawî li gorî vê sîstemê tên nivîsîn. Yanî helbeskar li gor qaîdeyekê dinivîse û di bikaranîna zimanan de hevgerînek û hevsengîyek heye. Ger helbestkar zimanekî di çend malik an di risteyan de bi kar anîbe, zimanên din jî bi

vî awayî bi kar tîne.⁴ Dema em li mulemme'ên ku hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin ku mînakên vê yekê ne kêman.

Mulemme'ên tam jî di nav xwe de dibin kategoriyên cur bi cur, em di van mulemme'an de rastî şêweyên cuda jî tên ku her yek di nav xwe de li gor qaîde û sîstemekê hatine saz kirin ango di nav xwe de hev girtî ne. Helbestkar jî serî heta dawî li gorî sîstemekê helbesta xwe bi şêweyekê dihûne.

3.2.1.1. Mulemme'ên ku bi Malikan Hatine Nivîsîn

Di vê binbeşê de di edebîyata Kurdî ya klasîk de mulemme'ên ku bi malikan hatine nivîsîn hatine nixandî û li gorî nimûneyên ber dest şêweyên cuda jî edebîyata Kurdî hatine pêşkêş kirin.

Şêwe I: Di vê şêweyê de yekeya nezmê malik e û helbestên mulemme'ê bi vê teşeyê hatine nivîsîn. Lêbelê di vê şêweyê de ziman di malikên helbestê de tîkel dibe û rêjeya vê tîkelbûna zimanan hev du nagire. Carinan ziman di malikekê de kêman dibe û carinan jî zêdetir dibe. Em dibînin ku di vê şêweyê de rêje û zêdebûn û kêmbûna zimanan zêde ne girîng e, jixwe di vir de ji bo rêjeya zimanan pergalek bi rîkûpêk nîne û ev jî yek ji qaîdeyê vê şêweyê ye. Herweha hemû ziman jî bi vî rengî di malikan de tên bikaranîn.

Ferqa vê şêweyê ya herî mezin ev e ku di vê şêweyê de pîrzimanîya mulemme'ê li ser esasê perçe, terkîb û îzafetan hatiye saz kirin. Lêbelê di şêweyên din de pîrzimanîya mulemme'ê li ser esasê nîvrîste, rîste, malik û bendan hatiye saz kirin. Mulemme'a Qanî û Bazelî jî bi vê şêweyê hatine nivîsîn.

Helbestkarê bi navê Bazelî bi zimanên Kurdî, Erebi, Farisî û Tirkî mulemme'ê ke jî neh malikan pêk hatiye nivîsîye. Di vê şêweya mulemme'a Bazelî de pergalek bi rîkûpêk nîne, lêbelê di hemû malikan de herî kêman du ziman hene. Di hin ciyan de rîste û di hin ciyan de jî malik bêyî hebûna pergalekê jî çend zimanên cuda pêk hatine. Doskî jî vê şêweyê re gotiye şêweya tîkel (Ertekin, 2020:113-117). Malika yekem û ya dawîna a Bazelî weha ne:

1. Xawer mîsala surperî sîng sedefa mexmûrlibas
Rojek vexwendim ber derî **qalu te'el gel** min binas
9. **Eynel-hewes** pîrsî û çû li rê gote min: Ey **Bazelî!**
Dêm bedr û xebxeb hem çû kew danî menem **xeyrî-enas**
(Ertekin, 2020:117)

4 İstîsnaya vê yekê bi tenê mulemme'ên tîkel in (bnr.: **Şêwe I**) ku di wan de jî pergalek heye. Pergala di wan de jî xwedî teşeyekê ye û di hemû bendan jî malikan de ziman bêyî rêjeyek hev girtî hatine bikaranîn.

Di vê şêweya Bazelî de jî dîsa malikên mulemme'ê li ser esasê îfade û perçeyên ji çar zimanan pêk tê hatiye avakirin; ango di malikan de bingeh Kurdî ye û ji zimanên Erebî, Farisî û Tirkî ve perçe, terkîb û îzafet hatine bikaranîn. Dîsa Hemdî jî li ser sûreya Fatîhayê jî bi 11 malikan mulemme'ek têkel bi Soranî û Erebî pêk aniye (Bnr.; Mewlûd, 2013:17-18).

Şêwe II: Di vê şêweyê de helbestkar helbesta xwe bi malikan saz kiriye. Em di vê şêweyê de dibînin ku helbestkar her riste bi du zimanan (ango her malik bi çar zimanan) û bi vî awayî helbest jî bi tevahî bi çar ziman an jî zaraveyan nivîsiye. Di vê şêweyê de her risteyek bûye du perçe û bi vî awayî malik jî bûye çar perçe û herweha her perçeyek jî bi zimanekî an jî bi zaravayekî hatiye nivîsîn. Di vê şêweyê de taybetiya girîng ew e ku her malik tê perçekirin û her perçeyek jî bi zimanekî an jî zaravayekî hatiye nivîsîn.

Di edebîyata Kurdî de Mela Ezîzê Cebexçûrî helbesteke xwe ya ku ji heşt malikan pêk tê bi vê şêweyê nivîsiye. Li jêrê em ê cih bidin malika yekem û ya dawîn a vê helbestê.

1. Çîm tu sîyê zê mari sîye (Z), ey çavreşa min çav belek (K)
Enti hûsna fi felekik (E), kışkanır senden melek (T)

8. Ma pê çar zownon napêra (Z), feleka babîlê ziman (K)
Feya lillahi min durrin (E), diziverdi gul û mircan (T)
(Varol, 2017:58-59)

Weke ku ji mînakê jî dîyar dibe Cebexçûrî her nîvristeyek mulemme'a xwe bi zimanekî cuda an jî bi zaravayekî cuda nivîsiye. Ji aliyê şêwazê ve gelekî orjînal e û di edebîyata Kurdî de nimûneyên bi vî rengî jî kêr in. Cebexçûrî vê helbesta xwe bi zimanên weke Erebî, Tirkî û bi du zaraveyên Kurdî; Zazakî û Kurmancî nivîsiye. Rêza van perçeyan jî weha ye: Zazakî (Kirmanckî), Kurmancî, Erebî û Tirkî ye.

Şêwe III: Di vê şêweyê de helbestkar helbesta xwe dîsa li ser bingeha malikan saz dike. Di van malikan de her riste bi zimanekî hatiye nivîsandin. Helbestkar vê şêwazê heta dawîya helbestê didomîne. Di edebîyata Kurdî de Melayê Cizîrî, Mela Ebdulfettahê Hezroyî, Şêx Mihemmed Kerbelayî, Mela Yasîne Yusrî, Mela Ehmed Yalar, Şêx Îsmetullahê Karazî ('ismet) û gelek helbestkarên dinê helbestên xwe yên mulemme' bi vî şiklî dane. Li jêrê ji bo baş were fahmkirin em ê weke mînak çar malikên ewil ên mulemme'a Fethî bidin. Di vê şêweyê de jî ev mulemme' a Fethî ji aliyê hûnandina risteyan ve xwedî xisûsiyetekê ye û di ristina helbestê de risteyên hûnandî derketiye holê.

- | | | | | |
|-------|---|---|---|-------|
| Erebî | } | 1. Li diyarê te xerîb im ey tu kehfu'l-xureba
Tale ma lem nere minke'l-lutfe Ellahu cezak | } | Kurdî |
| | | 2. Ya meleze'l-xureba innî feqîrun we xerîb
Nezerek wer bide halê vî xerîbê sîne çak | | |
| Erebî | } | 3. Min hene bê hed xem û derdê 'ecîb pur mezin
Leyse fî qelbî hebîbun eyyuhel xillu siwak | } | Kurdî |
| | | 4. Kulle yewmin mewten lî firaqî qed bedet
Her dikêşim van cefayan û ez im her derdinak | | |

(Doskî, 2012: 131)

Ev helbesta Mela Ebdulfettahê Hezroyî ku bi şeweya mulemm'e'ê hatiye nivîsîn ji 18 malikan pêk tê. Di malikên helbestê de risteyek bi Erebî û risteya din jî bi Kurdî hatiye nivîsîn. Hezroyî di vê helbesta xwe de tişteki orijînal jî pêk anîye, lewra wî malika xwe bi kîjan zimanê xelas kiribe malika din jî bi wî zimanê daye destpêkirin. Gava em ji aliyê bikaranîna zimanan ve li helbestê dinêrin em dikarin bibêjin ku di helbestê de hunera î'adeyê ji bo zimanan hatiye bikaranîn.

Di edebîyata Kurdî de em rastî du helbestkaran hatin ku helbestên xwe bi vî awayî nivîsîne. Yek jê Mela Ebdulfettahê Hezroyî ye ku me helbesta wî weke mînak li jorê daye, yê din jî Şêx Îbrahîmê Çoqreşî ye. Helbesta Çoqreşî jî ji neh malikan pêk tê û bi Kurdî û Erebî hatiye nivîsîn (Doskî, 2011:37-38).

Mulemm'e'a Kerbelayî jî ji 16 malikan pêk tê. Kerbelayî vê mulemm'e'a xwe bi Kurdî û Erebî nivîsîye, risteyên yekem bi Kurdî ne û risteyên duyem jî bi Erebî ne. Ev mulemm'e'a Kerbelayî mulemm'e'ê tam e, lewra ji serî heta dawî jî bilî îstîsnayên biçûk bi heman şewazê hatiye nivîsîn. Her du malikên serî û her du yên dawî bi vî awayî ne:

1. **Hemakellahû ya bedre'l-temamî** (E)
Heyatî feda ke ya ibn-e'l-kiramî (K)
2. Gulê rûyet ji pertawê bi pertew (K)
Kehûrîn meqsûratîn fi'l-xiyamî (E)
15. Di cayê Xusrew û Dehhak û Cemşîd (K)
Tekun fi ihtîşamîn we ihtîramîn (E)
16. Du'a-xwahê te bende Kerbelai (K)
Yebellixû ke ettehiyete bi selamî (E)

(Akdağ & Soylu, 2002: 50-51)

Şêwe IV: Di vê şêweyê de her malîkek bi zîmanekî ye û di helbestê de herî kêmbi zîman tîn bikaranîn. Seranserê her malîkekê bi yek zîmanî ye û her malîk bi zîmanekî cuda tê nivîsandin. Helbestkar di vê şêweyê de dîsa li gorî esasê malîkan tevdi gere û sînore hejmaran zîmanan tune ye yanî dikare di helbestê de jî zîmanekî zêdetir zîmanan bi kar bîne.

Di edebîyata Kurdî de li gorî nimûneyên ber dest nûnerê vê şêweyê yê yekem Hemîdî ye. Cefer Quliyê Zengelî jî bi zîmanên Tirkî, Kurdî û Farisî mulemme'ê neh malîkî nivîsîye (Jafarzade & Bedirxan, 2018:129). Lêbelê şêweya wî her çiqas li ser esasê her malîkek bi tevahî bi zîmanekî hatibe nivîsîn jî wî malîkek bi Tirkî û piştî wê jî du malîk bi Kurdîya Kurmançî nivîsîye û ev şêwe heta bi dawî dewam kiriye. Feqet malîkek tenê ango malîka herî dawî ya helbestê jî bi Farisî nivîsîye û di şêweya xwe de şikestineke biçûk pêk aniye.

Hemîdî helbesta xwe bi vê şêweyê, bi çar zîmanên cuda honandiye û zîmanên malîkên helbesta Hemîdî bi rêzê; Kurdî, Tirkî, Farisî û Erebî ne. Ji bo ev şêwe baş were fahmkirin me çar malîkên serî weke mînak da.

1. Wacib û lazîm li her kes kin jî bo mîrê kubar (K)
Hem senayan hem du'ayan da nemînîn dîn û har (K)
2. Weqt xoş der 'endelîban nale û efxandar (T)
Gül açılmış nali ü bilbil fixanları berar (T)
3. Da'îma dewlet ba dewlet serara wasf-î dar (F)
Bulbulan ra naxme bayed der çemen-zar-î bihar (F)
4. Min 'ecîbullah îna qed nerî bil-î'tibar (E)
Rewzete ma xeyret menzîl û wes-serfîha ma yedar (E)
(Ertekin, 2020:14-16)

Di vê mulemme'a Hemîdî de 28 malîk hene, lêbelê malîka 16em ku ew jî li gorî sîstema mulemme'a şair divê bi Erebî bûya wenda ye ango jî nusxeyan nehatiye xwendin. Hemîdî vê helbesta xwe bi çar zîmanan honandiye û her çar zîman bi vê rêzê heft caran hatiye dubarekirin. Safî Hîranî (1873-1942) jî bi Soranî, Tirkî, Erebî û Farisî mulemme'ê neh malîkî nivîsîye. Du malîkên ewil bi Soranî paşê bi rêzê du malîk bi Tirkî, du malîk bi Erebî, du malîk bi Farisî û malîkek dawî ya mexlesê jî dîsa bi Soranî ye (Bnr.; Hîranî, 1973:22-23). Ev şêwe jî hinekî dişibe şêweya Hemîdî, lêbelê ev mulemme'ê her du malîk bi zîmanekî ye, lê ya Hemîdî her malîkek bi zîmanekî ye.

3.2.1.2. Mulemme'ên ku bi Bendan Hatine Nivîsîn

Şêwe I: Di vê şêweyê de her risteyeke bendê bi zimanekî cuda tê nivîsîn û ev şêwaz ji bilî îstîsnayên biçûk heta dawîya helbestê didome. Di vê şêweyê de di edebîyata Kurdî de nimûneya yekem ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye dayîn. Xanî helbesta xwe bi teşeya çarîneyê nivîsiye û her risteyeke bendê bi zimanekî cuda hatiye nivîsin. Dema em li mulemme'ên vê şêweyê mêze dikin tê dîtîn ku hemû ziman weke hev di helbestê de cih digirin û ji serî heta dawî bi heman awayî didome.

Di edebîyata Kurdî de bi vê şêweyê helbestkarên weke; Ehmedê Xanî (pênc çarîne), Şewqîyê Xanî (şes çarîne), Mela Ehmedê Xasî (heşt pêncîne), Mela Mihemmedê Lîceyî (heft çarîne), Mela 'Ebdul'ezîzê Bidlîsî (Şeyda) (yanz-deh çarîne) û Mihemed Emînê Heyderî (heft çarîne û şes çarîne)⁵ bi vê şêweyê mulemme'ên xwe nivîsiye. Li jêrê em ê mînak Mela Mihemmedê Lîceyî (Hadî) û Ehmedê Xanî bidin. Benda ewil û ya dawî yên Hadî ev in:

1. Nûru 'eynî nûru 'eynî qelle we'zdade'eş-şu'ûn (E)
Taxt ber dil, leşkerê xemnake salarê cinûn (F)
Taqetim taq oldî, bende qalmadi sebr û sukûn (T)
'Eql û dîn te bir bi talan, can û dil te kir zebûn (K)

7. Kun edîben **Hadî**ya, la tebxî fî'l-erzî'l-fesad (E)
Mislê Seyfeddîn mebaş bî bak ez ehlê reşad (F)
Bîrgun elbette bulur zalîm cezasini çoq şîdad (T)
Hadî mûnqadê Şehê Sanî bi Şahê dehnimûn (K)

(Acar, 2013:26-27)

Mulemme'a Lîceyî bi tevahî ji heft çarîneyan pêk tê, di hemûyan de bend bi Erebi dest pê dike; piştî bi risteyên Farişî, Tirkî û risteya dawî jî bi Kurdî diqedê. Lîceyî di mulemme'a xwe de hemû ziman weke hev bi kar anîne.

Mulemme'a Xanî ji pênc bendan pêk tê û her risteyeke bendan bi zimanekî cuda hatiye nivîsîn. Di mulemme'a Xanî de hemû ziman weke hev hatiye bikaranîn. Xanî di hemû bendan de bi zimanê Erebi dest pê kiriye, risteya duyem bi Farişî, risteya sêyem bi Tirkî û risteya çarem a dawî jî bi Kurdî nivîsiye. Dema em ji aliyê şêweya serwabendîyê li vê mulemme'a Xanî mêze dikin tê dîtîn ku bi şêweya "Murebbe'a Muzdewic a Asayî" hatiye nivîsîn. Ji bo bibe mînak em ê benda pêşî û paşî yên mulemme'a wî li jêr bidin.

5 Bi teşeya bendan du mulemme'ên Heyderîzade hene; ya heft çarîne çar zimanî û ya şes çarîne jî sê zimanî ye.

1. Fate 'umrî fî hewake ya hebîbî kulle hal (E)
Ah û nalim hemdemem şod der fîraqet mah û sal (F)
Ger benim kanım dîlersen çokten olmışdır helal (T)
Mest û serxwoş im ji işqê min nema 'eql û kemal (K)

5. Hel lena mîn nî' metî'l-wesli hebîbî mîn nesîb? (E)
Uftadem ber deret bîçare, sergerdan, xerîb (F)
Derdimin çok olduğundan ona yoktur hiç tebîb (T)
Ey tebîbê min! Dewayê derdê **Xanî** her wîsal (K)
(Yıldırım, 2014: 185-186)

Murebbe'a mulemme' li gor danayên ber destê me cara ewil ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn. Berî Xanî mulemme' hatine nivîsîn, lê di edebîyata Kurdî ya klasîk de li gorî daneyên ber dest Xanî cara ewil bi çarîneyan mulemme' nivîsîye.

Şêwe II: Di vê şêweyê de helbest dîsa bi bendan tê nivîsandin, lê di vê şêwazê de helbestkar bendekê ji zimanekî re benda din jî risteya dawî ne tê de ji zimanekî din re terxan kiriye. Di vê şêweyê de risteya dawî ya hemû bendan bi heman zimanî hatiye nivîsîn. Weke mînak Mela Nezîrê Bedewî (Dahî) mulemme'eke bi vî rengî nivîsîye û di mulemme'ê de weke qistas risteya pêncem ya hemû bendan ji zimanekî re veqetandiye ango di mulemme'a Dahî de risteyên dawî yê hemû bendan bi Kurmancî ne. Her du bendên serî yê mulemme'a Dahî weha ne:

1. Min li dunyayê didîtin kul di dil de çûne der
Ez ji ber wan pur dinalim ey gelî dosta hewar!
Ku 'aşîq gelokê delal bû dil li ber pencê xedar
Nêrgizên nazik delalîn wa sema kirine xubar
Musîbet tenê li ser me daima weqtê êvar

2. Qed sebertû fîl mesaîb fesbîrû sebren cemîl
Fî'l-mesaîbî rebîhtû haza lî fedlûn cezîl
Sebbehellahû 'eleyna we 'ele'l-ebdî'r-rehîl
Biha sare fîdareynî hakimen fî selsebîl
Dê çi bit halê me îro dil û cerga xwîn di xwar
(Doskî, 2012:65-66)

Dema em li vê helbesta Mela Nezîrê Bedewî (Dahî) mêze dikin her du ziman weke hev nehatine bikaranîn. Lê di helbestê de ji ber ku sîstemek heye û ji serî heta dawî ev sîstem hatiye şopandin me ev helbest weke mulemme'eke tam bi nav kir. Helbesta Dahî ji şeş pêncîneyan pêk tê û sê bend bi Erebi û Kurdî ne, sê bend jî xwerû bi Kurdî ne. Herweha ew bendên ku bi Erebi hatine nivîsîn jî risteya

wan a pêncem bi Kurdîya Kurmancî ye. Yanî di eslê xwe de hemû risteyên dawî yê helbestê bi Kurdî ne.

Şêwe III: Di teşeyên musemmetan (teşeyên lêkdayî) de ev şêwe tê dîtîn. Di bendan de nexasim di terkîb û tercî'-bendan de em rastî nimûneyên vê şêweyê tîn. Ev şêwe di nav xwe de gelek cureyên cuda dihewîne. Di vê şêweyê de jî herî kêm du ziman tîn bikaranîn.

Mela Huseyîne Bateyî jî helbesteke xwe bi vê şêweya mulemme'ê nivîsîye. Bateyî helbesta xwe bi teşeya Terkîb-Tercî'a Murebbe' û Muserre' Digel Navbenda Dumisrayê nivîsîye. Helbesta Bateyî bi tevahî ji heft bendan pêk tê û du risteyên dawî yên bendên helbestê bi Erebi ne. Bateyî vê helbesta xwe li gorî sistemekê ji serî heta dawî bi heman awayî nivîsîye.

1. Ey ne'tê tu ez erşî heta fersî şehîra
Ez pertewê nûra te cîhan geştî munîra
Ey seyyîdê 'alem bike perwayê esîra
Ey tacê serê şah û selafîn û emîra

**Qed kane lekel fedlû lekel cûdû kesîra
Ursîlte îlel xelqî beşîren we nezîra**

7. Ey seyyîdê 'alem senedê nûra hîdayet
Hêvî dikine em ji te ey sedrê rîsalet
Mehrûm nekî tu me ji dîwana şefa'et
Batî bi cehennem nebirî roja qiyamet

**Qed kunte lehû semme şeff'en we zehîra
Ursîlte îlel xelqî beşîren we nezîra**

(Sadînî, 2011:83-85)

Di vê musemmetê de Bateyî di çarîneyan de Kurmancî bi kar anîye û di malikên navbendê de jî zimanê Erebi bi kar anîye. Her heft bendên helbestê jî bi vî şiklî bi zimanên Kurdî û Erebi hatiye honandin û di dawîya hemû bendan de risteyek Erebi tekrar e.

2.2.1.3. Mulemme'ên ku bi Teşeyên Dariştî Hatine Nivîsîn

Mustezad, weke têgeha edebî di edebîyata klasîk a Rojhilatê de teşeyeke helbestê ye ku li dawîya risteyên qesîde, xezel û hwd, risteyeke kurt tê zêdekirin (Adak, 2019:582).

Ehmed Begê Fettah Begê Sahibqîran (Hemdî) jî bi teşeya mustezadê bi zimanê Soranî û Farisî mulemme'ek heşt malikî nivîsiye. Malika yekem û ya heştam a vê şêweyê weha ye:

- | | |
|------------------------|---|
| دینه سه سه شموقم عیباد | یار نهگهر نهمشه له مووچهی من بکا ماچی زیاد |
| لمعه باشد مستراد | شمع آسا مصرعم از نور رویش لمعه داد |
| شیتتی وهک حهمدی نهیی | 8. غهیری مهجنون عاشقی جددی نهبوو عهمدی نهیی |
| کی بود حوری نژاد | نازنین او نباشد مثل لیلا در بلاد |
- (Mewlûd, 2013:136-137)

3.2.2. Mulemme'ên Naqis

Hin mulemme' hene ku ne li gor sistemekê hatine nivîsîn ango pergalek di wan de tune ye. Ji ber pêname û sedemên ku me berê jî anîbûn ziman; me mulemme'ên bi vî rengî weke "mulemme'ên naqis" bi nav kir. Di van mulemme'an de helbestkar li gor qaîdeyekê tevnagere û carinan perçeyek, niv-risteyek; carinan risteyek û carinan jî hemû malik an jî bendên helbestê bi zimanekî cuda dinivîse. Ji ber ku tê de sistemek, qaîdeyek û rêbazê hevgirtî tune ye mulemme'ên naqis derdikevin holê.

Herweha ayet, hedîs û gotinên di zimanekî de meşhûr ku bûne wecîze di malikekê de bi rêya îqtîbasê hatibe bikaranîn ew jî nabin mulemme'ên tam (Pala, 2007: 340). Belkî em wan di çarçoveya mulemme'ên naqis de bikaribin binirxînin. Di mulemme'ên naqis de rêjeya bikaranîna zimanan di malik û bendan de ne weke hev e. Di navbera riste, malik û bendan de aheng û wekhevînek ji aliyê ziman, sistem û rêbazê ve tune ye. Şêweyên ku di mulemme'ên tam de tên xuyakirin di mulemme'ên naqis de jî dikare werin dîtin.

Şêx Ehmedê Feqîr bi teşeya muxemmesê bi Kurdî û Farisî mulemme'ek du zimanî nivîsiye (Acar, 2016:492-493). Ev mulemme'a wî ya heşt bendî dikare bibe mînaka mulemme'a naqis. Ev helbesta Feqîr ji aliyê teşeyê ve xwedî rêbazekê ye û teşeya wê "Muxemmesa Mutekerrira Cot a Asayî" ye. Lêbelê ji aliyê rêjeya zimanên risteyên mulemme'ê û rêzkirina zimanên wê ve ev mulemme' ne xwedî pergaleke bi rêkûpêk e û di sistema wê de şikestin heye. Herweha her du risteyên dawîya hemû bendan jî Farisî ye û tîkare e.

Ji ber ku ehlên edebîyata klasîk di medreseyan de perwerde dîtine tesîra zimanên weke Erebi, Farisî li ser wan çêbûye. Ji ber vê yekê di edebîyata klasîk de helbestên bi vî rengî gelek in. Di rastiyê de ev helbest ji mulemme'an bêtîr dişibin hunera telmî'ê. Telmî' ew huner e ku malikeke an risteyeke an jî perçeyeke risteya helbestê bi zimanekî cuda hatibe nivîsîn (Külekçi, 2013:186). Ji ber vê yekê gelek çarçûn telmî' weke mulemme' hatine binavkirin. Ji bo ku em jî nekevin heman şaşiyê, me mulemme'ên ku tenê di çend cih û aliyên wan de kêmasî hebin ango bi tevahî nabin mulemme'ên tam me ew wek "mulemme'ên naqis" pêname kir.

Divê sînorên telmî' û mulemme'ên naqis neyên tevlihevkin. Di her muleme'ê de telmî' heye, lê di her telmî'ê de mulemme' tune ye (Karak, 2020:119). Cihê ku lê telmî' hebe dibe ku mulemme' li wir tune be. Lêbelê cihê ku lê mulemme' hebe li wir teqez telmî' jî heye. Weke mînak; ger helbesteke ji 10 malik an jî ji bendan pêk hatibe û tenê malikek an jî bendeke wê bi zimanekî cuda hatibe nivîsandin me ew wek telmî' bi nav kir û ew tevî wê xebatê nekir. Lê ger helbest bi piranî weke mulemme' hatibe nivîsîn; lê di hin riste, malik an jî bendan de şikestin çê bûbe, me ev yek jî weke mulemme'ên naqis bi nav kir. Di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî mulemme'ên bi vî rengî yên naqis pir in. Lewra Kurd jî perçeyek ji medenîyeta Îslamê ne û di bin tesîra zimanên weke Erebi, Farsi û Tirkî de mane û ev tesîr rengê xwe daye helbestnûsiya wan jî.

Em ê bi çend mînakên wê tevlihevîyê îzah bikin. Weke mînak helbestên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Şêx Ehmedê Feqîr ji bo wê yekê dikarin bibin nimûneyên wê mijarê.

1. Dilber şikîna şekerek **fe qultu ya rûhî meta**
Go min heta xatîr hebit min go çi kim ez ba heta

6. Me j' buğçeya yar zeyyinî bê pursi yek sêvek çinî
Febima ceneytu ceneytî elqet 'eleyye cînayeta
(Doskî, 2019: 24)

Dema em li wê helbesta Melayê Cizîrî mêze dikin tê dîtîn ku mulemme'êke naqis e. Lewra di helbesta Mela de her du malikên ewil û malika çarem xwerû bi Kurdî ne. Malikên sêyem, pêncem û şeşem jî risteyek bi Kurdî û risteyek jî bi Erebi ne. Herweha di rêzkirina zimanan de jî sistemek tune bû. Lê di helbestê de mulemme'bûnek heye qe nebe nivê wê dikeve nav sîstema mulemme'ê. Ji ber van sedeman jî ev helbesta Mela dibe mulemme'êke naqis.

12. Gelek sotim kîrim kîbab
Kîrye bi min sed reng xîrab
"Ya leytenî kuntu turab"

Wêran ez im malim xîrab

13. **"Ya leytenî kuntu"** vexûr
Wey nazîka min te ji dûr
Bêhiş kîrim zilfê di hûr
Wêran ez im malim xîrab

(Sadînî, 2014: 157-161)

Ev helbesta Feqîyê Teyran bi tevahî ji 16 çarîneyan pêk tê û bi teşeya "Murebbe'a Mutekerrîra Kit a Bêmetle"ê hatiye nivîsîn. Feqî tevahîya helbesta xwe bi Kurdîya

Kurmançî nivîsîye. Lêbelê di nav hewqas bendan de tenê di du bendan de perçe û risteyek bi Erebbî bi kar anîye. Ev yek jî dikeve çarçoveya telmî'ê (telmî': di helbestekê de herî kêr bikaranîna du zimanan e), ne ya mulemme'ê. Di edebîyata Kurdî de mînakên bi vî rengî pir in û gelek kesan ev nimûne weke mulemme' bi nav kirine. Lê divê em sînoren mulemme' û telmî'ê tevlihev nekin. Lewra ger em helbestên bi vî rengî weke mulemme' bi nav bikin dê aloziyek derkeve holê û dê ferqa telmî' û mulemme'ê jî hev nemîne. Çimkî hema bibêje di hemû dîwanên Kurdî de helbestên bi vî rengî cih digirin û dê ev her du terz û termên cuda werin tevlihevkirin. Piraniya bikaranînên bi vî rengî jî îqtibas in.

9. Hewa qelbî nezer daye
 Ji mir'atê xeber daye
 Bi vî rengî semer daye
 "Şu'a'un fî îşaratî"

10. Şu'a'a derdê min dûr e
 Di behrê qulzemê kûr e
 Ji şewqa şûşeyê nûr e
 Ji vê misbah û mişkatî

(Acar, 2016:226)

Dema em li vê mulemme'a Şêx Ehmedê Feqîr mêze dikin, bi teşeya murebbe'ê hatiye nivîsîn û bi tevahî 13 bend in. Şêx Ehmedê Feqîr risteyeke van bendan bi Erebbî nivîsîye, lê di hin bendan de risteya bi Erebbî tune ye. Weke mînak dema em li benda pêncem û 10em mêze dikin, em dibînin ku di van bendan de risteyên bi Erebbî tune ne. Di hin bendan de jî rêza rêzkerina risteyên Erebbî hatine guhertin û ev guhertin di sîstemê de şikestinê pêk tîne. Ev yek jî sîstema ku di helbestê de hatiye sazkerin xera dike û mulemme'a naqis derdixe holê. Ji ber ku tenê di du bendan de risteyên bi Erebbî tune ne û di 11 bendên mayî de jî şikestin hebe jî ev yek helbestê jî çarçoveya mulemme'ê dernaxîne, lê sîstemeke şikestî derdixîne holê. Lewra ji ber van egeran me ev helbest xiste nav kategorîya mulemme'ên naqis.

4. ENCAM

Mulemme' ew helbest in ku bi çendîn zimanan têne nivîsîn. Helbestkar di helbestên xwe yên mulemme' de du an jî ji diduyan zêdetir zimanan bi kar tîne. Mulemme' şêweyeke kevin a helbestê ye ku dîroka wê heta sedsala X'em diçe. Mulemme' cara ewil jî aliyê helbestkarên Fars ve hatiye bikaranîn ku nûnerê yekem ê vê şêweyê Şehîd Belxî ye. Piştî Farisan ev şêwe jî aliyê helbestkarên Erebbî ve jî hatiye bikaranîn û herweha jî aliyê helbestkarên Tirk û Kurd ve jî dîsa mulemme' hatine nivîsîn. Mistefa Elîyê Gelîbolûyî, Kurdî jî di nav de bi heşt zimanan

mulemme'ek 10 malikî nivîsiye. Di hemû malikên vê helbestê de risteyên ewil bi Tirkî ye û risteyên din jî bi zimanên cuda ne.

Di edebîyata Kurdî de jî ev şêwe gelek caran hatiye bikaranîn û kesên weke Hemîdî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Şewqîyê Xanî, Şêx Ehmedê Feqîr, Mela Ehmedê Xasî, Mela Ebdulfettahê Hezroyî, Kerbelayî, Mela Yasîne Yusrî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Mistefa Begê Kurdî, Nalî, Salim, Seydî, Cefer Qulîyê Zengelî bi şiklê mulemme'ê helbestên xwe nivîsiye. Ev lîste dikare gelekî dirêjtir bibe.

Di vê xebatê de em li ser mulemme'ên edebîyata klasik a Îslamî û bi taybetî jî li ser nimûneyên edebîyata klasik a Kurdî û şeweyên mulemme'ên edebîyata Kurdî sekinîn. Herweha ji aliyê avakirinê ve jî dîsa em li ser tesnîfa mulemme'an sekinîn û em gihastin wê encamê ku divê mulemme' bi telmî' û îqfîbasê re neyê tevlihevkirin û di nav xwe de jî mulemme' weke mulemme'ên tam û mulemme'ên naqis werin binavkirin. Li gorî daneyên ber dest di kategoriya mulemme'ên tam de weke nimûneyên ewil em gihastin nimûneyên sedsalên 16em û 17em. Di van sedsalan de di edebîyata Kurdî de mulemme'ên Hemîdî, Mela û Xanî hatin dîtin. Di edebîyata Kurdîya Kurmancî de jî li gorî daneyên ber dest nûnerê yekem Mela Mehmûd (Hemîdî) e.

Dem a em li helbesta Hemîdî mêze dikin tê dîtin ku wî di mulemme'a xwe de her çar ziman jî di nav hevşengîyê de weke hev bi kar îname. Mulemme'a Hemîdî ji serî heta dawî bi heman şeweyê hatiye nivîsin û hemû ziman weke hev di nav hevşengîyê de hatine bikaranîn. Ji ber vê yekê mulemme'a Hemîdî mulemme'eke tam e. Piştî Hemîdî Melayê Cizîrî jî bi şeweya mulemme'ê heşt helbest nivîsiye. Mela hemû mulemme'ên xwe bi Kurdî û Erebî nivîsiye. Di hin mulemme'ên Mela de sîstema mulemme'ê hatiye şikestin û mulemme'ên naqis derketine holê. Lewra di van mulemme'an de Mela di rêjeya bikaranîna ziman û di cihên rêza zimanan de şikestin pêk anîye. Piştî Melayê Cizîrî kesê ku bi şeweya mulemme'ê helbest nivîsiye Ehmedê Xanî ye. Xanî helbesta xwe ya mulemme'ê bi teşeya çarîneyê nivîsiye. Di mulemme'a Xanî de zimanên weke Erebî, Farsî, Tirkî û Kurdî cih digirin. Mulemme'a Xanî ji serî heta dawî bi heman şeweyê û sîstemê hatiye nivîsin, ji ber vê yekê mulemme'a Xanî jî mulemme'eke tam e.

Di mulemme'ên edebîyata klasik a Kurdî de nimûneyên bi malik, bend û teşeyên dariştî hatine nivîsin hene. Hemîdî û Xanî mulemme'ên xwe bi çar zimanên cuda nivîsiye û ev mulemme'ên çar zimanî jî ji bo edebîyata Kurdî ya klasik cihekî şanazîyê ye. Ev çar zimanî di edebîyatên Erebî, Farsî û Tirkî de gelekî kêman. Herweha Ehmedê Xasî û Mem ev hejmara zimanan zêde kiriye û zaravayê Zazakî jî lê zêde kiriye û mulemme'ên xwe bi pênc zimanan nivîsiye. Melayê Cizîrî jî hemû helbestên xwe yê mulemme' bi Kurdî û Erebî nivîsiye û di heyama xwe de di edebîyata Kurdîya Kurmancî de şairê ku herî zêde mulemme' nivîsiye dîsa Melayê Cizîrî ye. Melayê Cizîrî bi malikan heşt mulemme'nivîsiye.

Di nav nimûneyên ewil ên mulemme'nûsên Kurd de di helbestên wan de em rastî zimanên Erebi, Farisî, Tirkî û Kurdî (Kurmancî) tên. Di mulemme'ên wan de em ji bilî van çar zimanan rastî zimanekî dinê nehatine. Lêbelê di nav helbestkarên Kurd de em rastî mulemme'ên ku bêyî zimanê Kurdî jî hatine ku yek ji wan Osman Esad Efendiyê Babij e. Babij mulemme'a xwe bi Farisî, Erebi û Tirkî nivîsiye û em tê de rastî zaraveyekî Kurdî nehatine.

Li gorî daneyên ber dest em dibînin ku di destpêkê de mulemme'nûsên Kurd mulemme'ên xwe bi zaraveyê Kurmancî nivîsîne û em rastî zaraveyên Goranî, Soranî û Zazakî nehatine. Lêbelê ji sed sala 19em û pêve mulemme'ên zaraveyên dinê jî tên dîtîn. Di edebiyata Goranî de di sed sala 19em de em rastî mulemme'ên Seydî tên. Seydî gelek mulemme'ên du zimanî yên Goranî (Hewramî), Faris û Erebi nivîsîne. Di edebiyata Soranî de nivîsîna mulemme'an di sed sala 19em de bi Nalî dest pê kiriye û bi helbestkarên weke Salim, Mistefa Begê Kurdî û Şêx Riza Talebanî ve ev yek dewam kiriye. Di edebiyata Zazakî de jî dîsa em di sed sala 20em de rastî nimûneyên ewil tên û helbestkarên weke Seydayê Xasî, Kavarî, Mem û Cebexçûrî mulemme' nivîsîne. Di Kurmancî, Goranî û Soranî de nimûneyên tezmînên mulemme'an jî gelek in.

Di mulemme'ên Kurdî de li gorî nimûneyên li ber dest em rastî mulemme'ên ku bi malik, bend (musemmet jî tê de) û teşeyên dariştî hatine nivîsîn hatin. Di nav van nimûneyan de çar şêweyên ku bi malikan, sê şêweyên ku bi bendan hatibûn nivîsîn û şeweyek jî ya ku bi mustezadê hatibû nivîsîn hatin tesbîtkirin. Di xebatên kûrtir de ihtîmal e ku nimûneyên kevintir û şêweyên cudatir ên mulemme'an jî werin peyda kirin.

Di edebiyata Kurdî de helbestkarên ku piştî sed salên 16em û 17em jîyane di mijara mulemme'ê de ketine bin bandora Hemîdî, Mela û Xanî. Kesên weke; Şewqiyê Xanî, Mela Ehmedê Xasî, Mela Mihemedê Lîceyî, Mela Ehmedê Heyderî, Karazî, Mela Emînê Heyderî di bin tesîra van mulemme'nûsan de mane û wan jî bi şêweyên cuda mulemme' nivîsîne.

5. ÇAVKANÎ

Acar, H. (2013). Mulemaya Seydayê Licî. *Mülemma Dergis.*, İstanbul: (j. 2, r. 23-27).

Acar, H. (2016). *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*. Stenbol: Nûbihar.

Adak, A. (2015). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*. Çapa 3. Stenbol: Nûbihar.

Adak, A. (2016). Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme'ên Wan ên Çarzimanî. *Nûbihar Akademî*. İstanbul: (j. 5, r. 36-65).

Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*. Stenbol: Nûbihar.

- Aksoy, H. (1993). Kınalızade Ali Çelebi ve Mülemma' Na'tı. İstanbul: *Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, (Sayı: 5-6, r. 125-144).
- Bacanlı, S. A. & T. K. (2018). Mülemma ve Abdülvâsi-i Cebelî. *Nûsha*, (Cilt 46, r. 143-156).
- Banarlı, N. S. (1983). *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*. İstanbul: Milli Eğitim Basımevi, (Cilt 1).
- Bedewî, M. N. (2012). *Dîwana Dahî*. Tehsîn İbrahim Doskî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Beyter, Ö. (2013). *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê.
- Botî, E. (2009). Di Şîra Kurdî de Mulemma'/Pir-zimanî: Mînaka Ehmedê Xanî. *Nûbihar*. Stenbol: (Cild:16, j. 107).
- Calp, M. (2018). Ahmed-i Hânî'nin Mülemma' Bir Gazeli ve Divan Edebiyatımızdaki Yeri. 2. *Uluslararası Ahmed-iHânî Sempozyumu (İslam Düşüncesinde İnsan, Ağrı: Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi*. (r. 162-181).
- Cizîrî, M. (2019). *Dîwan*. Tehsîn İbrahim Doskî (Amd), Stenbol: Nûbihar.
- Çiftçi, M. (2015). *Eqîdenameyo Zazakî yê Mela Mehmedê Hezanîyî*, Unîversîteya Çewlîgî. Teza Çapnebûyî. Çewlîg: Şaxê Mayzanîstê Ziwan û Edebîyatê Zazakî. Enstîtuya Ziwanê Ganîyan.
- Doskî, T. Î. & Z. E. (2019). Mela Mehmûd an jî Hemîdî: Şa'irê Berî Melayê Cizîrî û Yekem Mulemma'a Kurdî. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, (Sal. 5, Cild. 5, r. 43-61).
- Doskî, T. Î. (2011). *Mela Evdillahê Hîzanî û Şairên Malbata Wî*. Dihok: Spîrêz.
- Doskî, T. Î. (2020). *Baxê Îrem Geştek li Nav Şi'ra Kurmancî ya Klasîk*. M. Zahir Ertekin (Amd.). Stenbol: Dara.
- Ertekin, N. (2015). Mela Ehmed Yalar û Dîwana wî. *Diyarbakır: Alimler, Arifler, Edipler*. İstanbul: Ensar. (r. 413-436).
- Ertekin, Z. & A. Yıldız. (2020). Mela 'Ebdul'ezîzê Bitlîsî/Şeyda (1855-1924) û Mulemma'a Wî ya Çarzmanî. *Kovara Nûbiharê*, İstanbul. (j. 151, r. 69-73).
- Gelibolulu, A. (2013). Mulemma. Abdurrahman Adak (Amd.). *Mülemma Dergisi*, Mardin: (h.1, r. 5-6).
- Gezer, S. (2015). *Dîwana Mela Yasîn Yusrî (Metin û Lêkolîn)*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Çewlig: Zanîngeha Bingölê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanîsta Ziman û Edebîyata Kurdî.
- Hewremanî, S. (1971). *Dîwanî Seydî*. Mohammed Emîn Kardoxî (Amd.). Suleymanî. Çapxaneyî Kameranî. Berêberayetî Xwêndinî Kurdî Giştî.

- Heyderî, Ş. M. E. (2012). *Dîwan*. Mela Dîya'îdîn Heyderî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Hîranî, S. (1971). *Dîwana Safî*. (Çapa 3.). Guwî Mukrîyanî (pêşgotin) Hewlêr. Çapxaneyê Kurdistan.
- Hezroyî, M. E. (2012). *Dîwana Fethî*. Tehsîn Îbrahîm Doskî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Kakeyî, H. *Dîwana Hilmî Kakeyî*. Gihandina Dawî:26.11.2020. <https://books.vejin.net/>
- Kalyon, A. (2015). Üç Dilli Şair Ayşe Teymûrî'den Üç Dilli Gazel. *Turkish Studies*. Ankara. (Spring, r. 1425-1436).
- Karak, M. Z. (2020). *Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Kavarî, M. (?). *Dîwan*. Serdar Bedirxan (Amd.). Ebdulbaqî (Katib), Diyarbakır: ?.
- Kerbelayî, Ş. M. (2002). *Dîwana Kerbelayî*. Osman Akdağ-Kerem Soylu (Amd.). Stenbol: Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.
- Kırcan, A. (2012). Beşanê Edebîyatî ra Mulemma, Di Şaîranê Kurdan ra di Şîrê Bêhempayî: Mulemmaya Ehmedê Xanî û Mulemmaya Ehmedê Xasî. *Kovara Şewçîla*. İstanbul: (j. 7, r. 56-62).
- Kırcan, A. (2018). *Biyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêka Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*. İstanbul: Vate.
- Kurdî, M. B. *Dîwan*. Gihandina Dawî: 05.07.2020, <https://www.vejinbooks.com/text/936>
- Kurtuluş, R. & İ. Pala. (2006). Mulemma. *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi* (Cilt. 31, r. 539). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.
- Külekçi, N. (2013). *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*. Ankara: Akçağ.
- Lezgîn, R. (2011). Mulemmaya Ehmedê Xasî. *Kovara Şewçîla*. İstanbul: (j. 1, r. 7-9).
- Lîceyî, M. M. (2012). *Dîwana Hadî*. Tehsîn Îbrahîm Doskî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Nûranî, Î. Deh'ebasanî N. A. & Ehmedî, S. (h. 1397). نقد و بررسی ملمع' های کردی- پارسی. از جهت ساختار و پیوند معنایی. *Pejûheşnameyê Edebîyatê Kurdî*. Danişgahê Kurdistan, (Sal: 4, j. 5, r. 1-32).
- Pala, İ. (2007). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, İstanbul: Kapı Yayınları, (çapa 15.).
- Sadînî, M. X. (2011). *Mela Huseynê Bateyî -Jîyan, Berhem û Helbestên wî-*. Stenbol: Nûbihar.

- Sahibqiran. E. F. (2013). *Dîwana Hemdî*. (Çapa 5.) Ebdullah Xidir Mewlûd (Amd.). Hewlêr. Çapxaneyê Rojhilatê.
- Salim. *Dîwana Salim*. Gihandina dawî: 05.07.2020. <https://books.vejin.net/ck/text/4196>
- Seblaxî, E. (1969). *Dîwana Wefayî* (Mîrza Ebdurehîmê Seblaxî), Muhemmed Seîd Necarî (Amd.). Senendec. Întişaratê Kurdistan.
- Tendurekî, M. Z. (2007). *Dîwan*. Mela Abdurrahman Bîçîcî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Teyran, F. (2014). *Feqîyê Teyran Jîyan Berhem û Helbestên Wî*. (Çapa 8.). M. Xalid Sadinî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Timurtaş, A. (2020). Hunera Mulemme'ê di Edebîyata Rojhilat de -Mînaka Şi'ra Kurdî-Kurmançî-. *Kurdîyat*. (j. 1, r. 9-21).
- Varol, M. (2017). Şiiri Mulemma ê Şairanê Edebîyatê Zazakî. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. (Cild.3, j. 6, r. 51-65).
- Xanî, E. (2014). *Dîwan*, Kadri Yıldırım (Amd.). İstanbul: Avesta.
- Yıldırım, K. (2013). Klasîk Arap, Fars, Türk ve Kürt Şiirinde Mulemma. *Mulemma Dergisi*, (j.1, r. 7-11).

Extended Abstract

In this study, an evaluation was made on mulammas within the framework of classical literature. As a literary term, multilingual poems are called mulemma in the literature. Mulemma poetry has a historical background in classical Eastern literatures, and the first examples are seen in Persian literature in the 10th century. In this study, information about Turkish, Persian, Arabic and especially Kurdish mulammas was presented and the mulammas of Kurdish poets were analyzed and evaluated in terms of structure. At the same time, in this study, it was tried to determine the mulamma forms in Kurdish literature.

Mulemma type of poetry is not an art that everyone can easily handle because it requires the ability to poetry in different languages. Kurdish poets, like the poets in Arabic, Persian and Turkish literature, have managed to use their pen skillfully on this subject. Four-language mulammas in Kurdish literature have a considerable number of examples. Likewise, besides different dialects of Kurdish in Kurdish literature, generally Arabic, Persian and Turkish languages were found in mulammas.

In the introduction part of the study, the definition of mulamma was made and information about its use in Eastern literature was given. The relationship of the Mulammas with "telmi" was revealed and its borders were evaluated once again. It was pointed out that the telmi and mulamma should not be mixed.

With this study, examples of mulamma poems were found in 4 different dialects of Kurdish, and mulammas in which different forms were used. Historical information about

Kurdish literature in Kurdish, Gorani, Sorani and Zaza were included and these mulammas were examined in terms of their structures. In addition, in this study, the mulemma examples of poets according to the dialects of classical Kurdish literature were evaluated under separate headings.

In this study, it was tried to classify mulemmas in classical Kurdish literature in terms of structure. In Kurdish literature, examples of mulammas written in couplets, bent and derivative forms were encountered in terms of form. It was seen that these shapes also have different forms among themselves. In this study, mulammas were first categorized as complete and incomplete mulammas. Later, the classification of all the different forms and forms of this category was done through examples. According to the available examples, examples of mulemma with couplets in Kurdish mulemma forms, 3 forms with clauses and another form in another form were found.

According to the sources we have, the first examples of full mulammas in classical Kurdish literature date back to the 16th century, and again according to the available data, the first example was written by Hemîdî in Kurmanji. Melayê Cizîrî, Şêx Ehmedê Xanî, Şewqiyê Xanî, Mela Huseynê Bateyî, Ce'ferqulîyê Zengelî, Şêx Îbrahîmê Çoqreşî, Şêx Mihemed Emînê Heyderî in Kurmanji dialect; Mela Muhemmed Hewremanî (Seydî), Hîlmi Kakeyî in Gorani dialect; Many poets of mulamma have been found in Sorani such as Mela Xidir (Nalî), Ebdurrehman Beg (Salim) and in Zaza, Melayê Xasî and Mela Ezîzê Cebexçûrî.

